Pencereyeke vekirî



Enwer Mihemed Tahir

DÎMOKIRASÎ Û DÎMORSÎKIRINA CIVAKÊ

Dibêjin ku civakê me, li van çend salên bêt, dê bîte civakekî sêvêl û dîmokirasî, çunkî çend rêkxirawên mirovayetî û ne hikumî peyda bûna û kesanên rewşenbîrî çend pertuk û deh cara hind gotar li nivîsîne û ji xwedê bereket van hemû TV û setelayta bi şev û roj çavpêketina dikin û sêmanara girêdidin serê axivtinê û binê axivtinê behsê dûmokrasiyê fereh hizbî û civakê sêvêl dikin, evca milet, ma te çi divêt, dê bibî dîmokrasî dê!?!..

-Yên li vê hizrê dinivêsin ku civakekê sêvêl û fereh hizbî û guhertina deshelatê bi rengekê aştîxwzyane wek sêstema cîhana pêşkeftî û şer vêca dê şêwazekê bajirvanî wergirêt û dê li bin quba perlemanê û dezgehên rewşenbîr û leberêt rojnama şaşên Tv hemî heq hesaba bak kin. Ez dibêjime wan ez jî bendê xişîm jî digel wan dibêjim.

- Xewa xwe yaro... Ew war e bes ne ew bihar e!!? Bo derbasbûn bi vê rê hêş gelek maye û dîmokrasî û qayîl û razîbûn bi beramberî û evê dî " alxêr" ne bi daxwaziya hîvîya dibêt, belku qunaxeka dirêj û pêdivî bi sinc rewşt û rewşenbîriya dîmokrasî divêt.

Hege em li mal û xêzana xwe li fermangehê dîmokrasî nebin li qutabxana qutabî fêr nebin, gelek zehmete, her çar sala carekê ji ber xatira elan û melana xwe bikine dîmokrasî.

Belê evê dibêjim û qet pê reşbîn nînim, çunkî me hingava yekê li vê riya dirêj havêt, hêvî dikim berpirs û serkirdêt kurd xwe bikine nimûne û mamoste, da me fêrî dîmokrasiyê û ferehizbî û civakê sivêl bikin...

Hun hemû di gel min bêjin: Amîn!